

## Pirsgirêka newekheviyê

Sala borî, daweta keça nivîskar û lêkolînera Tûnisî Ulfa Yûsif li ser medyaya civakî bû sedema nîqaşan dema ku du jinan, "her du dayikên bûk û zava", bi amadebûna dadwerek jin peyman îmze kirin.

dom»R:10






## Şerê dawî

Piştî kuştina Serokê Hamasê Îsmaîl Henîyye li Tehranê, Rejîma Îranê hest bi şikestineke kûr a stratejîk û ewlekarî dike. Mêvanekî pir hezkirî yê Xamineyî di roja sondxwarina serok komare nû yê wê rejîme de li navenda Tehranê hat kuştin û hêzên ewlehiyê yên Îranê nekarîn wî bişopînin. Xamineyî û karbidestên leşkerî û siyasî yên Îranê piştre gefa tolhildanê ji kuştina "mêvanê xwe yê ezîz" li Îsraîlê xwarin.

dom» R:5

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (476) 21-08-2024 Buha (1000) Tûmen*

## Çima xelk li Rojhilatê PDKÎ ê bi partiya xwe dizanin?

Serdêra wê gotarê pirsek sentrak û girîng derheq PDKÎê e ku pêdiviye carek din û piştî derbazbûna 79 salan li ser roja avakirina PDKÎê ve, carek din em ji xwe bikin û cehdê bikin ku bersivek pêbawer û rast bo wê bibînin ku ji me re bibe alîkar û berçaronîyê bide me di pêvajoya xebatê de bo gihîştin bi wan armancên ku em jêre di refên PDKÎê de dixebtin.

dom» R:3

# Yêkgirtina Hizba Dêmokrat, serkevtinekî netewî



N. Nûredîn Sofîzade




Li 30ê Gelawêja 1401 a Rojî de, herduk aliyên Hizba Dêmokrat piştî 16 salav jev weqetiyanê bi belavkirina daxuyaniyekê û li merasimekî bi şan de, mizgîniya yêkgirinê dane gelê Kurd û xwezî û daxwaza wan hasil kirin.

Ku wisaye Gelawêjê herwekî gelek rojên dine ye xwe, dawî roja xwe terxan kir bi vê yada pîroz û girîng û kevte nava rojên pîroz û wekî rojekî serkevtina netewî bo xelkê Rojhilatê Kurdistanê kevte nava rûpelên dîroka pir ji xebata Hizba Dêmokrat.

Li ber hindê em dikarin bibêjin ku yêkgirtina Hizba Dêmokrat destkevta netewî bû, çimku li heyamê 16 sal jev weqetiyanê de, tu carî xelkê Rojhilatê Kurdistanê êtiraf bi 2 Dêmokrat bûnê nekirin û li wî heyamî de tu caran rexne û nerazîbûna xwe neveşartin û berdewam daxwaza yêkîtî û yêkgirtina Hizba xwe dikirin.

Li ber hindê em dikarin bibêjin ku yêkgirtina Hizba Dêmokrat destkevt û xweziya netewî bû, çimku piraniya hêz û aliyên siyasî û netewî li her çwar perçên Kurdistanê, jev weqetiyana Hizba Dêmokrat bi xisar û bandora nerênî bi ser xwe jî dizanîn û berdewam daxwaza yêkgirtina herduk aliyên wê Hizbê dikin.

Me dît ku dema mizgîniya yêkgirtina Hizba Dêmokrat bû cihê dilxweşiya gelê me li Rojhilat û perçên dine ye Kurdistanê û bandorekî erênî dana ser xebat û pêywendiyan, û rûpelekî nû li ser xebat û berxwedan û dilgermiya xortên şorişvan û xelkê welatparêze Kurdistanê dana.

Hizba Dêmokrat bi yêkgirtina xwe ku qonaxekî nû ji xebatê dest pê kir, li gelêjan û li ber bandora mizgîniya dilxweşkere wê yêkgirtinê li nava xelkê Rojhilat de ku daxwaziya wan bû, me dît ku piştî 20 rojan bi hêceta kuştina keça Kurd a bi nave Jîna Emînî, xelkê weke derfet û hêcetekî ku nîşan bidin ku yêkgirtina Hizba Dêmokrat çi qas bandora dilgermiyê li ser wan hebûye, û bersivek bo amadeyîya fidakariyê bo bi gurtirbûna xebatê bi Hizba xwe, serhildanekî mezin û bi girse dest pê kirin ku gelek nekêşa ku perên xwe havêtne seranserî Îranê jî.

Em dikarin bi xatircemî ve bêjin ku hekî yêkgirtina Hizbê nebaya, renge kuştina Jîna Emînî jî weke gelek cinayetên rêjîmê bi bê dengî derbas bibaya.

Jev weqetyana Hizbê gelek xisarên siyasî, netewî, hizbî û civakî bi dû xwe de anîn, lewra yêkgirtina wê jî li henber de, serkevtin û destkevtên mezin bi du xwe de anî.

Hizba Dêmokrat bi yêkîtî û yêkbûna xwe hertim cihê hivya gelê Kurde û dê her wisa bimîne û çavê gel li xebat û ezmûna wê Hizbê ye ku serkevtina Netewî û gehîştin bi armancên bilind jî her ji rêkea vê hizbê de bidest ve bên.

Pîroz be yadê 2 saliya vê yêkgirtina malbata mezine Dêmokrat li endam û alîgir wê û gelê Kurd.



## 28ê Gelawêjê, fitwaya cîhad û şerekî berdewam li dijî Kurd

dom» R:4



## Jîngeha Zagrosê li ser lêva kendalê jinavçonê de ye

dom» R:6

# Peyama Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 79emîm salvegera avakirina vê hizbê

25ê Gelawêja îsal, hevdem digel 79emîn salvegera avakirina Hizba Dêmokrat a Kurdistanê li ser bingeha Komeleya Jiyaneweya Kurd "J.K." ye. Avakirin a Hizba Dêmokrat tevî ku çend heyvan piştre Komara Kurdistanê li ser deştê Pêşewa Qazî Mihemed hate avakirin, destpêka qonaxeke nû û modêrn li tevgera siyasî-netewiya xelkê Kurdistanê ye.
Destkevt û mîratên meinewiyên Hizba Dêmokrat û Komara Kurdistanê wek wêjmana netewî, nasmanexwaziya netewî, danîna Ala û sirûda neteyewî û avakirina hêza Pêşmerge wek spaha niştimanî, bûne xalên guherînê li xebata netewiya Kurd û karlêkeriyeke wiha kûr danî ser tevgera siyasiya Kurd ku piştî derbasbûna 79 salan, niha jî rênîşanderê xebata azadîxwaziya Kurd li hemû beşên din ên Kurdistanê ye.

Hizba Dêmokrat li heyama 79 sal tekoşîn li pêxema bidestveanîna maf û azadiyên xelkê Kurdistanê û serxistina xebata gelê Kurd, gelek qonaxên dijwar û zehmet derbas kirine. Li dema serkevtinan de ji xwe enda nekiriye û bi berçavgirtina siyaseteke serast û piştgirêdan bi îradeya cîvaka Kurdisranê û bi mukumî li berdewamkirina xebat û erkê dîrokiya xwe, bi ser xisar û rewşên qeyranî de zal bûye û li demên tengasiyan û şikestan de qet bê hivî nebûye.

Li encama siyaseta sîstematîk a tepeserî û dijîgeliya her du rêjîmên Pehlewî û komara Îslamî ku her tim bi çavê ewlehî mêzeyî pirsa Kurd kirine, Hizba Dêmokrat li wî heyamî de gelek nirxên mezin li pêxema bidestveanîna xwest û daxwaziyên xelkê Kurdistanê de dane. Hekî ji aliyekê bidarvekirina Pêşewa Qazî Mihmemed û terorkirina du rêberên mezin ên vê Hizbê Şehîdan "Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî" û şehîdbûna hezaran kadir û pêşmerge û terorkirina sedan têkoşeran û êrîşa mûşekî bo ser Hizba Dêmokrat, bi wateya dijayetiya herî zêde ya wan du rêjîman digel tevgera mafxwzaneya xelkê Kurdistanê bûye, ji aliyeke din ve nîşanderê rewabûna tevgerekê ye ku Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi hêz û giraniyê, bi piştîvaniya bi hêz û îradeya gel, rêberiya vê kiriye û berdewam dike.
Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ku xwediyê derbasbûyîyekî mezin û tejî şanazî ya xebatkarane li hemû waran de bi taybet siyasî û pêşmergane ye, li heyama wan 2 salên derbasbûyî de li berdewamiya tevgera "Jîna"yê de ku hem ji aliyê rêjîma komara Îslamiya Îranê ve êrîşa mûşekî û dironî bo ser hate kirin û hem cehda bertengkirina tekoşîna vê hate dan û hem ji aliyê pêwajoyeke qorixçî li nav opozîsiona Îranê de li derveyî welat, cehda jirêderxistina naveroka tevgera mafxwazaneya xelkê Îranê û şerê wêjmana li dijî naveroka tevgera Kurdistanê dihate dan, karî hişmendane û li hemen demê de bi şiyan, erkê dîrokiya xwe li ser bingeha berevanî ji mafê netewî yên xelkê Kurdistanê û tekez û tekezî li ser berdewamkirina xebatê û karî li hember pîlanên curbicur ên neyaran de bisekine.

Bandor û pêgeha Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li kom û komikên navnetewî, hizb û alî û kesayetiyên siyasî yên opozîsiyona Îranê û netewên din û ji hemûyan girîngtir, li nava civaka Kurdistanê de ji hemê demekê zêdetir xurt buye. Cehdên cur bi cur ên opozîsiyona Îranê li derheq pirsa alternatîvçêkirin û hewldan bo dariştina platform û bername bo çawatiya dariştina Îranê li paşerojê, da xuya ku bê girîngîdana serekî bi pirsa Kurd û giranî û rola Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, îmkana pêkhatin a her cure platformeke dilxwaz û bersivder bo Îrana paşerojê, bêhêz e. Pêşwaziya xelkê Kurdistanê li helwîsta baykotkirina her du binav hilbijartinên meclîsa şêwreya îslamî(li 11ê Reşemeya 1402) û serkomariyê(li 8 û 15ê Pûşpera îsal) û bangêjî bo neçona ser sendûqên dengdanê û herwisa reftar û helwîst û peyamên xelkê Kurdistanê li rêûresmên Newrozî yên Îsal de, da xuya ku helwîst û wêjmana vê Hizbê li praktîk û helwîsta qatên cuda yên civaka Kurdî de bi eşkere hate dîtin û xelkê Kurdistanê wek hertim, Hizba Dêmokrat bi rêber û rênîşanderê xebata netewiya xwe dizane.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi şirovekirin û hilsengandinên xwe li tevgera Jînayê û beşdariya giştî ya hemû qatên civatgeha Kurdî li tevgera gelê me de, rola jinan û Ciwanan, qutabî û xwendekaran, mamosteyên xwendingehan û mamostayên Olî, bazarî û dukandaran û hemû rêkxistinên medenî û çalakvanên medenî, bi bilind radigre û piştevaniya xwe



li xebata giştî li Kurdistana Îranê dubare bike. Her wekî ku li deqeke fermî û erêkirî ya rêberiya Hizba Dêmokrat de hatiye; "Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê tevî piştevanîkirin li xebat û pirsa Kurd li beşên din ên Kurdistanê, Rojhilat û Îranê bi meydana bingehîn a xebat û erkê dîrokiya xwe dizane. Lewma bi armancgirtina tevavetiya desthilata komara Îslamî, cehdê bo bihêzkirin û rêkxistina pitir a xebata giştî ya Rojhilatê Kurdistanê û berdewamiya vê li cehdên xwe bo çêkirina pêywendiyên zêdetir digel netewe û aliyên siyasiyên din ên Îranê de dide. Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bona xistina qedemaye komara Îslamiya Îranê tevî liberxwegirtina hemû şêwazên xebatê gorî rewşê, piştevanî li şêwazên medenî yên xebatê bi armanca zêdetirkirina giştgîrtirkirina tevgera siyasî-netewî ya gelê kurd li Îranê de dike.

Hevdem digel rêzgirtin ji yada 79emîn salvegera avakirina Hizbê, gelek bi ci ye ku bûyereke din a jiyana Hizba xwe bi bîr bînin ku du sal berî niha û li hemen heyvê de wek rûpeleke tejî destkevt li dîrokê de hate tomarkirin, Ew jî yekgirtina du aliyên Hizba Dêmokrat bû ku bi "Yekgirtina Dêmokratan" hate navdêrkirin.

Yekgirtina Dêmokratan piştî 16 salan ji hev weqetiyanê, li 30ê Gelawêja 1401 a Rojî de û li encama proseyeke tejî seh bi berpirsiyaretîkirin û bi girîngzanîna xwesta xelkê Kurdistanê û dilsozên Hizbê, gihîşte encamê ku bi keyfxweşiyê ve, bû destpêka qonaxeke nû ji xebata vê Hizbê li dijî rêjîma komara îslmaiya Îranê û bû faktereke bi hêz bo bandora vê li ser tevgera netewiya Kurd û ne bi tenê li Rojhilatê Kurdista, belku li asta Îranê de jî. Her wekî me li şoreşa Jînayê de dît ku civaka Kurdistanê li çi astekê de baweriya xwe bi Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê dane xuya û herwisa ew bandor û karlêkeriya vê bi çi şêwazekê, komara Îslamiya Îranê bo tolhidan ji Hizba Dêmokrat hay da.
Niha ku em li yada 79 saliya avakirina Hizbê bi bilind radigrin, bo careke din digel xelkê Kurdistanê, malbatên serbilindên şehîdan û girtiyên siyasî û tevahiya endam û alîgirên Hizbê, peymanê nû dikin ku heta bidestveanîna armancên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ku palavtî ji xwest û daxwaziyên civaka Kurdistanê li pêxema bi destveanîna vê de hezarn kes ji rêberatî, kadir, pêşmerge û endamên Hizbê canê xwe fîda kirine, vê dozê berdewam bikin.

Li dawiyê de bi hilkefta 79emîn salvegera avakirina Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, silav li yad û navê avakerê Hizba Dêmokrat, Pêşewa Qazî Mihemed, şehîdên rêber bi taybet "Dr. Ebdulrehman Qasimlo û Dr. Seîd Şerefkendî", şehîdên nêzî 80 sal tekoşîn û xebata bi dom a vê Hizbê û malbatên wan ên rêzdar û hemû têkoşerên vê rêbazê û herwisa hemû endamên Hizbê, hemû qatên civaka Kurdistanê û Pêşmergên Kurdistanê ku bi cangorîkirin, erkê xweragirî û piştevanîkirina bê sînor, alîkariya derbasbûn ji rêyên dijvar û qonaxên dijwar ên jiyan û xebata Hizba Dêmokrat dane, dikin.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Navenda Birêveberî**

**Gelawêja 1403 a Rojî**

# Çima xelk li Rojhilatê PDKÎê bi partiya xwe dizanin?






N. Elî Munezemî

Serdêra wê gotarê pirsek sentrak û girîng derheq PDKÎê e ku pêdiviye carek din û piştî derbazbûna 79 salan li ser roja avakirina PDKÎê ve, carek din em ji xwe bikin û cehdê bikin ku bersivek pêbawer û rast bo wê bibînin ku ji me re bibe alîkar û berçaronîyê bide me di pêvajoya xebatê de bo gihîştin bi wan armancên ku em jêre di refên PDKÎê de dixebtin.

Bo bersivdan bi wê pirsê pêdiviye ku em du faktorên dîrokî û mercên piştigiriya xelkê li partiyê di serdema niha de berçav bigrin.

Jiber ku eslê dîroka her partiyekê ewan şert û mercan ji xwe digre ku ew partî gihîştandiye roja îro û qasa piştgiriya xelkê ji partiyê jî dide eyankirin ku ew armancê partî bo xebatê dike, heta çi qasî xelk wan armancan bi yê xwe dizane.

**Mercên dîrokî** - Bo têgiştin li dîroka PDKÎê, em dikarin wê dîrokê li ser pênc Qonaxan de dabeş bikin:

Qonaxa yekemîn dema pêş damezirandina PDKÎê ye ku bû esas û damezirandina PDKÎê kire pêwîstî, Di serdema şerê cîhanî ê duyemîn de, bi armanca rizgariya ax û xelkê Kurdistanê rêkxistinek siyasî a nepenî di sala 1942an de pêkhat bi navê komeleya Jêkaf. Piştre ew komeleya bi sedema berfireh kirina çalakiyên xwe, şêveya rêkxistinîya xwe guhert û li ser xîmê wê, Hizba demokrat di 16 tebaxa 1945an de hate damezirandin.

Ewê rêkxistinê li ser du hêlên netewesazî û rizgariya axa Kurdistanê xebata xwe domand û karî di 22ê çileya paşîn a 1946an de komara Kurdistanê li ser parek li axa Kurdistanê awa bike. Ew yeka dide eyankirin ku PDKÎ li ser bingeha tomarên dîrokî, partiyeke ku bo realîzekirina armanca çêkirina dewlet-netewe a kurdî xebat kiriye û ew yeka jî bûye sedem ku hemû dijminên kurdan bi baldarî çalakiyên wê partiyê bişopînin.

Qonaxa duyemîn li serdema hiloşîna komara Kurdistanê di 17 çileya pêşîn a 1946an heya konfiransa sêyemîn a partiyê di 1972an ji xwe digre. Di wê qonaxê de PDKÎ li gor şert û mercên dijvar ên xebatê, carek qedera xwe bi partiya Tûde ku partiyek Îranî a komûnîst bû, girê da û kete bin bandora siyaseta xelet a wê partiyê.

Lê zû karî xwe li wê qederê rizgar bike û carek din bizivire ser hêla xebata xwe ya netewî û piştre jî ku xebata kurdan li Başûrê Kurdistanê vegeşiya, piştgiriya wê xebatê bike û tê de beşdar be.

Lê gava ku şert û mercên xebatê li Başûr realîstane fikir jê kirin, hêla xwe ji wan cuda kirin û giraniya xebata xwe xistin ser Rojhilatê Kurdistanê û mafê netewî di wê para welat de. Lê siyaseta xwe bo piştgiriya xebata xelkê kurd di perçeyên din yên Kurdistanê de wek xalek exlaqî, pêdagirî li ser kirin û domandin û ew siyaseta heya îro rojê berdewam e.

Qonaxa sêyemin li kongira3 a PDKÎê heya Şehîdbûna dr. Sadiq Şerefkendî di 17 îlona 1991an dom kir û ewê xebatê din bin rêberiya Qasimlo û Şerefkendî de karîn rêbazek dewlemend a siyasî bo çarenivîsa kurdan di Rojhilata Kurdistanê de biafirîne û berxwedanek xurt a çekdarî birêve bibe.

Qonaxa çaremîn ku piştî şehîdbûna Şerefkendî destpê kiriye û heya îro berdewam e, hêza xwe bêhtir li du qonaxên yekemîn û sêyemîn werdigre. Ew du qonax di hizra netewî a xelkê Rojhilatê de bandorek bêhempa çêkiriye û ew yek jî fersendê dide rêberiya qonaxa çaremîn ku bikare xelkê bo piştgiriya armancên xwe mobîlîze bike.

Ew qonax yekcar zaf hestyar e û ger rêberî sermayeya xwe a merivî bi başî nas neke û wan bo karûbarên siyasî, rêkxistinî û çekdarî perwerde neke, yê ew qonaxa bibe yêkek li dirêjtirîn qonaxa xebatê û nikare me bigihîjîne serkeftinê.

**Armancên PDKÎê – armancên xelkê Rojhilata Kurdistanê**

PDKÎ her li dema damezirанê heya îro, armancên xwe li gor armancên xelkê Rojhilatê Kurdistanê formule dike û ew yeka jî bûye sedem ku xelk her tim piştgiriya wê bike û serkeftin û şikestên wê jî bi yên xwe bizane.

Doktor Qasimlo serkeftina PDKÎê di meydana siyaseta Rojhilatê Kurdistanê de dizivirîne ser 3 xalan. Ew sê xalên balkêş wiha ne:

1- Siyaseta realîstane a PDKÎê, Her wek hûn jî dizanin, ew siyaset ji aliyê kongireyên partiyê tên dariştin û ji aliyê rêberiya hizbê we bo praktîzekirinê dibin bername û endamên partiyê jî wan bernameyan praktîze dikin.
2- Piştgiriya xelkê li PDKÎê, Qasimlo ewê xalê bi xala here girîng a serkeftina partiyê dizane ku ew yek bo dabînkirina sermayeya madî û merivî a partiyê serkaniya herî bi nirx e.

3- Xebata pêşmerge û endamên partiyê, Pêşmergeyan her tim di xebata rizgarîxwazane û berxwedana xelkê kurd bo azadiyê rolek girîng hebûye û ew yeka jî ji aliyê Qasimlo ve gelek girîngî pê hatiye dan.

Bi bavera min pêdivîye ku carek din û bi hêceta 79min salvegera damezrana PDKÎê em wan faktorên dîrokî û ew faktorên ku bandorê li ser xelkê me çêdikin bo piştgirî kirina wan li xebata PDKÎê, pêdagiriyê li ser bikin û ewan xwe re bikin alav bo wegeşandina xebatê û realîzekirina armancên xwe.

Nabe em ji bîr bikin ku li ber wê xebatê ye ku bi hezaran kesan li Rojhilat navê zarokên xwe kirine Pêşmerge, Komar, Pêşewa yan Gelawêj. Bes pêdivî ye ku xebata me li gor çavnihêriya xelkê be.

Ez 79min salvegera awakirina PDKÎê li xelkê Kurdistanê, malbatên şehîdan û kadr û pêşmergeyên partiyê pîroz dikim û hêvî dikim serkeftin para xelk û welatê me be.

# Mistefa Hicrî: “Ciwan hêza tevgera guherînên kûr ên siyasî û civakî li avakirina paşerojeke cuda ne”



Rêzdar Mistefa Hicrî, berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta roja cîhaniya Ciwanan peyamek belav kiriye.

Deqa peyamê wiha ye:

Roja cîhaniya Ciwanan, ku ji aliyê Kora Giştî ya Saziya Netewên Yekgirtî ve bi dirûşma “Avakirina cîhaneke beştir, tevî ciwanan” wek boneyeke cîhanî diyarî kiriye, li hemû ciwanên Kurdistan û Îranê pîroz be.


Komara îslamiya Îranê wek rêjîmeke paremayî û tepeserker, ne bi tenê ti bawerî bi vê sermayeya civakî nîne, belku zêdetirîn rol li serkut, îşkence û kuştina ciwanan de hebûye.

Derbasbûyî û nihaya vê rêjîmê li destdanîn bi ser mafê jiyana modern, şikandina keramet û bêparkirina wan li warên siyasî, civakî, aborî û …hd, hewcehî bi belgeyan nîne.

Li rewşeke wiha de ciwan bi hişarî û Îradeya tekoşîn li pêxema jiyaneke hêja, li ser şeqaman û li xwendingehan û warên din, palder û beşdarê tevgera giştî û nerizayetiyan li dijî rêjîmê bûne, bi taybet ku pêgeh û hêza pengurî ya ciwanên azadîxwaz û şoreşgêr li tevgera Jînayê, ti gumanek nehiştiye ku ciwan, wek sermayeyeke mezin û bi nirx a mirovî û civakî, li avakirina paşerojeke geş rola bingehîn û hêza bizivîner a guherînên kûr ên siyasî û civakî li avakirina paşerojeke cuda jî derbasbûyî hene.Ev boneye li hemû ciwanên xwedî seh û şoreşgêrên Îran û Kurdistanê pîroz be.

**Mistefa Hicrî Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a kurdistana Îranê 22ê Gelawêja 1403 a Rojî**

# 28ê Gelawêjê, fitwaya cîhad û şerekî berdewam li dijî Kurd



**N. Elî Budaxî**
**W. Bêhzad Simko**

Ew şerê ku komara îslamiya Îranê ji hemê waran ve digel Kurdan dike, her ji destpêka serkevtina şoreşa sala 1357 a Rojî bi leşkerkêşiya hêzên çekdar ên hikûmeta navendî li ser bingeha fitwaya ayetullah Xumêynî bo jinavbirina binav “kufir” li Kurdistanê, dest pêkir. Kufra mezin a Kurd ew bû ku bi zûkatî naveroka desthilata nû li Têhranê nas kir û amade nebû vê rêjîmê bi fermî nas bike. Kufir ew bû ku xelkê Kurdistanê ew maf û azadî û ew destkevt dixwastin ku bi dirêjahiya dîroka hevçerx li pêxema vê xebat kiribûn û çemek ji xwînê bo dabûn. Kufir rawestan li hember desthilata rêjîmeke tepeserker û “Ne”gotin bi heliyan û asmîlebûn û bindestiyê bû. Ew jî ji dîtingeha melayên cemaranê “tawana mezin” bû ku Kurd dibiya nirxa vê bide û ji vê demê ve gelê me zêdetir ji 4 dehilan e ku nirxa mafxwazî û azadîxwaziya xwe dide.

Komara îslamiya Îranê li 4 dehikên derbasbûyî de zêdetir ji 2 hezar û 200 kes li Kurdistanê de bi tawana! Dijayetî digel nizama wilayeta feqîh, êdam kirine. Li navxweyê welat, li Başûrê Kurdistanê û derveyî welat, zêdetir ji 450 kadr û pêşmerge û têkoşerên Kurd, teror kirine. 32 gundên Kurdistanê de xelk komkuj kirine û li vê komkujiyê de 280 kes ji xelkê gundan ên pîr û ciwan û jin û zarok, komkuj kirine, herwisa 41 gund bi sedema berxwedana xelkê wan ji binî ve herifandine. Li meydana şerê rasterast de jî bi sedema êrîşa hêzên çekdar ên komara îslamî û berevaniya rewa ya hêza peşmerge, nêzî 7 hezar pêşmergeyên hêzên siyasî şehîd bûne û bi hezaran kes ji xelkê medenî û bê penah ku li nav wan de jî dîsan bi sedan jin û zarok têne dîtin ku canê wan ji wan hatiye standin. Zêdetir ji 2 hezar û 500 ke sji xelkê medenî- şiwan, werzêr, zarok, kolber, kasibkar- bi sedema teqîna mînan hatane kuçtin û zêdetir ji 4 heazar kes ji bi vê sedemê birîndar an kêmendam bûne.

Ew şerê sepiyayî li Kurdistanê, li hemû meydanan û bi hemû rê û şêwazekê berdewam bûye. Kurdistan bi sedema warê ewlehî, kêmtirîn pişka bûdce bo avedanî û berhemanînê diyarî kirine û heçi av, dar, kevir û zêr û kanên sirûştî yên ser erdê û jêr erdê, talan kirine û heta çêrîngeh û daristanê vê jî agir pêxistine û şewitandine, hejarî, bêderfetî, betaliya ji ast derketî bi berhevdanîn digel deverên din ên îranê ku lêkevtên siyaseta li bê pariyê de ragirtina aboriya kurdistanê ne, li deverên sînorî yên Kurdiastanê de geşe bi diyardeya kolberiyê dane, lê li vê derê de jî hêzn çekdar ên komara îslamî bo kasibkaran kemînan datînin û didne ber gullyean û roj nîne ku çend kolberên Kurd li nav xwînê de neyêne vegewizandin.

Ew şera li bestêna kultûrî û şerê nerm de jî hem berdewam bûye û hem encamên cuda li pey hatine. Stratejiya şerê nerm a rêjîmê li dijî Kurd ev bûye ku civaka Kurdî tûşî kiriza nasnamê bike, dîroka tevgera siyasiya Kurd çewt bike û asta daxwaziyên Kurd herî kêm a xwe daxîne, derbê li pêgeh û heybeta karîzma û rêberên tevgera Kurd bide, bi girîngîdan bi seha Îrançîtiyê hizra netewî û niştimaniya kurd bêhêz bike, bi çêkirina netifaqiyê li navbera civaka Kurdistanê û Hizbên Kurdî, derbê bi bawerî û hitbara hêzên dijberî xwe bide û meydanê bi wan bide walakirin û cara dawî bi curekê bide nîşandan ku ti car tiştek a bi navê pirsa Kurd li îranê her nebûye û nîne! Lewma bo vê armancê jî îmkanat û hêza madî û miroviyeke gelek zêde amade kiriye. Lê tevî ew pîlan û pilanên hûr û gir û nerm û dijvar komara îslamî, neku ti qazanceke wiha bo rêjîmê nebûye, belku encama bervajî jî li pey xwe aniye.



Wek mînak, rêjîmê gelek cehd kir ku Kurd li Rojhilatê Kurdistanê de ji nasnama netewiya xwe dûr bixe, lê her bûyer û pêngaweke girîng û dîrokî li derheq pirsa Kurd-Heta li beşên din ên Kurdistanê de- dengvedana vê li ser şeqam û çalakiyên Rojhilatê Kurdistanê de bi çavê xwe dibînin. Rêjîmê gelek cehd kir ku dîwareke mezin li navbera Kurdên Şîe û Sunnî û destexwîşkiya Mihabad û Sine û Kirmaşan û Urmiyê de çê bike, lê erdheja Kirmaşanê û ew hemaseya netewiya ji Mako heta Serpila Zehaw ve bi rê kevt, ew dîwara bi serê komara îslamî û startejîstên vê de herifand. Rêjîma Îslamî çi nema neke, daku Hizba Dêmokrat û hêzên din ên Kurdî ji berçavê xelkê bêxe, lê dema xwest encama 4 dehik ji cehd û bernamedanîn û xercên vê li mûşekbarankirina li 17ê Xermanan û payîza 1401 a Rojî ya binkeyên Hizba Dêmokrat de hilgire, mangirtina 21ê Xermanana 1397, mangirtina payîz û yên paştir ên 1401 û serhildana xelkê Kurdistanê bo xwedîderketin ji kur û keçên pêşmergên xwe û hizba xwe ya xoşewist, komara Îslamî tevizand û be’ecand.

Piştî 45 sal, 28ê Gelawêjê û roja bîranîna fitwaya Xumêynî li dijî netewa Kurd nîşanderê 2 cîhanbîniyên cuda yên Kurd û komara îslamî ye û herwisa belgeya rewatiya xebata Kurd li îranê li pêxema mafê netewî û medenî yên rewa li dijî komara Îslamî ye.

# Şerê dawî



N. Dr. Mecîd Heqî

Piştî kuştina Serokê Hamasê Îsmaîl Henîyye li Tehranê, Rejîma Îranê hest bi şikestineke kûr a stratejîk û ewlekarî dike. Mêvanekî pir hezkirî yê Xamineyî di roja sondxwarina serok komare nû yê wê rejîme de li navenda Tehranê hat kuştin û hêzên ewlehiyê yên Îranê nekarîn wî bişopînin. Xamineyî û karbidestên leşkerî û siyasî yên Îranê piştre gefa tolhildanê ji kuştina "mêvanê xwe yê ezîz" li Îsraîlê xwarin. Asta alarma leşkerî li Rojhilata Navîn gihiştiye asta herî bilind. Gefên Îranê hevdem bûn bi êrîşên li dû hev ên Îsraîlê bo ser "Eniya Muqawimet" û rejîma Îranê ku meydana terorîzma navnetewî û çavkaniya darayî, bîrdozî û perwerdeyî ya terorîzmê ye, di bin zexta van şikestinan de hat şikandin.

Welatên rojavayî ku ji encamên şerekî "ihtimal" di navbera Îran û Îsraîlê de ku bibe şerekî navçeyî nîgeran in, hemû rêyên dîplomatîk û peywendiyên wan bi kar anîn da ku rê li ber êrîşa tolhildanê ya Îranê û hêzên ser bi wê bo ser Îsraîlê bigirin. Herî dawî jî Brîtanya, Fransa, Almanya, Îtalya, Amerîka û heta Îsraîl jî li ser encamên êrîşeke wiha hişyarî dabûn Îranê. Di 24ê Gelawêjê (14.08.2024) de, Xamineyî hişyarî wek şerekî "psîkolojîk" bi nav kir ku armanca wê tirs û paşvekişîna Îranê ye. Xamineyî got, "Em paşve venagerin," wî got ku paşvekişîn, hem di warê siyasî û hem jî di warê leşkerî de, dê bibe sedema "xezeba Xwedê". Ev tê wê wateyê ku Îran xwe ji şer re amade dike?

Komara Îslamî ya Îranê rejîmeke şer e ku bêyî şer, kaos û zordariya navxweyî ya hov nikare li ser desthilatdariyê bidome. Hemû arîşe nîşan didin ku şer di navbera Îran, Hizbullah û Îsraîlê de muhtemel e. Di egera şerekî di navbera Îran û Îsraîlê de, Amerîka bixwaze yan nexwaze wê neçar bimîne beşdarî şer bibe û piştevaniya Îsraîlê bike. Lê belê Îran li gorî hiqûqa navneteweyî ti hinceteke qanûnî nîne ji bo êrîşa li ser Îsraîlê. Ji ber ku Îsraîl kuştina Îsmaîl qebûl nekir. Lêbelê, dîroka êrîşa Îranê ya "bersiv" çiqas paşve derbas bibe, ew qas bêtir dikare were wateya amadebûna Îranê ji bo şer, ne ji paşvekêşana wê. Şerekî ku di hizra rêberên Komara Îslamî de "şerê dawî yê Rojhilata Navîn" û heta şerê dawî ye.

Îsraîl di bin serokatiya Benjamin Netanyahu de xuya dike ku xwe ji bo şer bi Hizbullah û heta bi Komara Îslamî ya Îranê re amade dike. Naha derfeta herî baş a Netanyahu li pêşiya hilbijartinên serokatiyê yên Novamber a 2024-an e. Vekişîna Joe Biden ji pêşbirka serokatiya Amerîkayê û hilbijartina Camilla Harris wek berbijara Demokratên serokatiyê, îhtîmala têkçûna Donald Trump zêde kiriye. Ger Biden namzedê serokatiyê bûya, bi hêvîya ku Trump bi dest bixe û piştgirîya Netanyahu bike, dibe ku Netanyahu bixwesta şerê bi Hizbullahê re heta piştî hilbijartinên Amerîkî paşde bixe. Lê aniha ku di pêşbirka hilbijartinên Amerîkî de guhêrbar hatiye guhertin, dibe ku Netanyahu berî hilbijartinê êrişî Hizbullahê bike û Îranê neçar bike ku hêza xwe ya herî stratejîk li herêmê biparêze. Ev şirove ji ber wê yekê ye ku di bûyera serketina Camilla Harris de, dibe ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê di bin serokatiya Camilla Harris de êdî nexwazin berdêla hemû siyasetên xelet ên Netanyahu û dewleta wî ya rastgir bidin. Ji ber vê yekê şert û mercên şerê bi Hizbullahê û Îranê re niha ji bo Netanyahû ji piştî hilbijartinên serokatiya Amerîkayê xweştir in. Ji aliyek din ve jî Komara Îslamî bi awayeke pratîkî Îsraîl dorpêç kiriye. Li başûrê Îsraîlê Hamas û Cîhada Îslamî hene, ku sûcê terorîstî yê 7ê cotmehê (7.10.2023) afirand û piştî Holokastê di rojekê de mezintirîn qetlîama Cihûyan kir. Li bakur, Hizbullaha Lubnanê heye, ku bi saya piştgiriya lojîstîkî ya Îranê bi deh hezaran mûşek û firokeyên bê firokevan hene û çendîn caran keleha hesinî ya Îsraîlê wêran kiriye û zêdetirî 100 hezar kes koçber bûne. Tewra bendera Hayfayê jî di bin gefa êrîşa Hizbullahê de ye, û di bin wê metirsiyê de ew bi rastî karbidestiya xwe ya bazirganî û trafîkê ya berê winda kiriye. Li başûrê Yemenê Hûsiyên Yemenê hene, ku di deh salên dawî de roketên Îsraîlî avêtine û heta karîbûn êrîşên bi balafirên bê mirov jî li ser paytext Tel Avîvê pêk bînin. Di vê navberê de Heşda Şeibî ya Îraqî ya bi piştgiriya Îranê ji dûr ve êrîşî Îsraîlê dike.

Tevî ku Îsraîl bi deh hezaran Filistîniyên bêguneh li Şerîda Gazzeyê kuştin jî, welat hîn jî di şoka meha Cotmehê de dijî. Di bin metirsiya Hizbullaha Lubnanê de, hebûna zêdetir ji 100,000 awareyên navxweyî li Îsraîlê



û malbatên rehîneyan bûye zextek neteweyî û niştimanî li ser hikûmeta Netanyahu. Niha di nav gelê Îsraîl de pirs ew e ku çima dewlet û artêşa Îsraîlê nikare dawî li vê pirsgirêkê bîne. Vê zextê dewlet, raya giştî û heta muxalefetê jî hişt ku em heta hetayê di bin gefa Hîzbullahê de bin û xelk nikarin vegerin malên xwe. Ji ber vê yekê divê dawî li van tehdîdan bê û êrîşek li ser Hizbullahê bê kirin da ku dawî li metirsiyê were û ewlehiya gelê bakurê Îsraîlê were dabînkirin. Ji bo Îsraîlê êrîşa li ser Hîzbullah û heta Îranê jî derfeta herî baş e. Ji bo Îsraîl, şerê westiyayî yê wekaletên Îranê li dijî wî welatî dê welatê wan lawaz bike. Di rewşeke wiha de dibe ku Komara Îslamî newêre rasterast piştgîriya Hizbullahê bike, ev yek dê Hizbullahê bi tevahî lawaz bike. Eger Îran ji bo piştevaniya Hizbullahê bikeve şer, ji aliyê Îsraîlê ve baştirîn derfet e ji bo têkbirina Îranê û gefên wê yên herdemî. Ji ber ku danberheva Îsraîlê ew e ku Amerîka di şerekî wiha de piştgiriya Îsraîlê dike. Ev yek dê bihêle Îsraîl tehdîda navokî ya Îranê jî ji holê rake. Karbidestên Îranî gelek caran gefa guhertina doktrîna navokî xwaribûn. Ger Îran çekên nukleerî bi dest bixe, îhtîmal e ku rasterast êrîşî Îsraîlê bike. Ji ber vê yekê, xwezayî ye ku destûr neyê dayîn welatek ku stratejiya wê tunekirina xwe ye, ku bigihîje çekên nukleer.

Di heman demê de, Hizbullah ji bo tolhildana kuştina fermandarê xwe Fuad Elî Şukr ji aliyê Îsraîlê ve, xwe amade dike ku êrîşekê bike. Nasrallah got ku Îran û Hizbullah mecbûr in ku tola van kuştinan hilînin.

Welatên rojava, di serî de rêveberiya Biden, bi tundî li dijî şerekî muhtemel di navbera Îran û Îsraîlê de û heta şerê bi Hizbullahê re ne. Hukûmeta Emerîkayê hewildanên mezin da ji bo peydakirina agirbesta di navbera Hemas û Îsraîlê de û bidawîkirina şerê Gazayê ku di encamê de bi deh hezaran filistîniyên bêguneh hatin kuştin û birîndar kirin. Netanyahu ne zêde alîgirê agirbestê ye, ji ber ku ji aliyekî ve bidawîhatina şer û agirbestê tê wateya serkeftina Hemasê û ji aliyê din ve bidawîbûna şer dikare bibe dawiya jiyana siyasî ya Netanyahu. . Lê tevî ku Koşka Spî li hember siyasetên Netanyahu di egera her şerekî di navbera Îran û Îsraîlê de ne, Amerîka dê beşdarî şerê parastina welat bibe. Şerek ku dikare bibe ya dawî. Tevî hemû rexneyên Qesra Spî li ser Netanyahu, wî welatî di deh salên borî de bi her awayî piştevaniya Îsraîlê kiriye û hêzeke deryayî û berevaniyê ya mezin li Rojhilata Navîn û deryayên navçeyê bi cih kiriye, ku ne hêzeke rêgir e.

Kurd û şerê îhtimaliye Îran û Îsraîlê?

Wezîrê Derve yê Brîtanyayê David Cameron piştî êrîşa balafirên bêmirov û mûşekî yên rejîma Îslamî ya Îranê li ser Îsraîlê di 13ê Nîsana 2024 de got: "Niha hemû cîhan naveroka (terorîst û êrîşkar) rejîma Îranê dizane." Ew mûşekên ku demekê serokên partiyên Rojhilatê Kurdistanê dikirin armanc, niha digihêjin Îsraîlê û îhtîmal heye ku eger Îran neyê rawestandin, ew mûşek deriyên Ewropayê jî bikin armanc.

Stratejiya eniya bi navê berxwedanê, tinekirina gelê Kurd û hemû dengên ku li Rojhilata Navîn pêşeroja aştiyane difikirin, ye. Şer wêraniyê tîne, şerekî ku miletê kurd ne beşdar e, ne sedem û ne jî destpêkerê wê ye. Şerekî ku tu eleqeya xwe bi Kurdan re nîne. Derfetên navneteweyî kêm bi kêrî Kurdan tên. Di heyama 45 salên borî de, rejîmê hemû şêweyên apartheid û jenosîdên sîstematîk ji bo jinavbirina gelê Kurd bikar aniye. Sirûştî ye ku derfetên navneteweyî ji bo berjewendiyên xwe yên netewî bi kar bîne.

Piştî destpêkirina Şoreşa Jina dengê "Jin, Jiyan û Azadî" li seranserê Kurdistanê belav bû û îradeya gelê Kurd bû daxwazeke gerdûnî. Lê belê ji ber dubendî û nebûna stratejiyeke yekgirtî ya neteweyî ya Kurdan, Kurd nekarîn gelek destkeftiyan bi dest bixin. Niha derfetên navneteweyî hewce dike ku tevgera Kurdistanê ji tixûbên partiyan firehtir bifikire û stratejiyeke netewî binirxîne. Niha dema wê ye ku hêzên siyasî, sivîl û elît ên Kurd di çarçoveya konferanseke netewî de xetên xwe yên stratejîk bi awayekî yekgirtî analîz bikin û pêkhateyeke netewî ya nû bibînin.

Kûrahiya kêşeyên di navbera Îran û civaka navdewletî de gihiştiye astekê ku Kurd dikarin xwe weke yek ji aktorên sereke yên guhertina siyasetên rejîma Îranê û heta hevsengiya hêzan nîşan bidin.

# Jîngeha Zagrosê li ser lêva kendalê jinavçonê de ye



N. Bêhzad Qadirî
W. Bêhzad Simko



Îsal jî wek hemû salên derbasbûyî, Bihar û havîneke karesatbar bo jîngeh û daristanên Rojhilatê Kurdistanê hebû. Hezaran Hiktar ji daristan, çêrîngeh û zewiyên xelkê li agir de hatine şewitandin, helbet li agirberdana bi zanebûn a dujminên jîngeh û axa Kurdistanê de. Rêjeya agirberdanê bi qasekî zêde bûn ku amareke hûr û serast ji qas û xisarên pêketî li ber dest nîne û heta niha jî encumenên jîngehî û çalakvanên jîngehî, mijûlê bihawarçonê bo jîngeha Kurdistanê ne û derfet peyda nekirine ku amara xisarên îsal bo hizra giştî belav bikin, helbet li wira de em dê îşare bi hinek ji wan bikin.

Îsal li hemû parêzgehên Rojhilatê Kurdistanê de em şahidê agirberdan bi jîngeh û xwezayê bûn. Berdewam nûçeyên agirberdan bi jîngeh û sirûşta "Selasa Bawecanî, Kirmaşan, Merîwan, Sewlawa, Bane, Pîranşar, Pawe, Îlam û …hd" hatine belavkirin û zêdetirîn agirberdan jî li Selasa Bawecanî û Merîwanê de hatine tomarkirin.

Li vê derheqê de "Encumena Keska Çiya" ya "Merîwan"ê li 10ê Gelawêjê de xiştеyek li agirpêketinên bi daristanên bajarên "Merîwan û Sewlawa"yê belav kirine. Pêka vê xiştеyê, li îsal ji 14ê heyva Xakelêwe heta 8ê heyva Gelawêlja îsal, 112 haletên agirpêketin li daristan, çêrîngeh û jîngeha bajarên "Merîwan û Sewlawa"yê, hatine tomarkirin. Lê hêj heta niha amareke hûr ji wan xisarên ku bi jîngeha Merîwan û Sewlawayê kevtine, li ber dest nîne.

Ji aliyeke din ve û pêka wêneyên esmanî ya satêlayta "Copernicus" a yekîtiya Ewropayê, zêdetir ji hezar û 500 hilkar ji daristan û çêrîngehên Selasa Bawecanî li agirberdana bi zanebûn li vê dawiyê, ji nav çone.

Li vê derheqê de jîngehparêzan ragihandine ku bi sedema nebûna xizmetguzarî û xemsariya navendên pêwendîdar ên rêjîmê li deverê, tevî cangorîkirina jîngehparêzan û xelkê xwebexş, bi vê rêjeya zêde daristanên vê deverê şewitîne.

Li vê derheqê de "Esxer Axaz", fermandeyê Yekeya Parastina Jîngeha Kirmaşanê, tevî îşarekirin bi zêdebûna agirberdanên li Kirmaşanê, li hevpeyvîn digel malperên ser bi rêjîmê yên navxwe gotibû: "Ji destpêka sala 1403 heta niha 20 agirpêketin bi berpaniya hezar û 900 Hiktarî qewimîne". Her çiqas ku amara serast ji vê rêjeyê zêdetir e, lê hekî her pêka vê amarê be jî, li îslal de rêjeya agirberdanan li Kirmaşanê de 20 qat zêde bûye. Cihê gotinê ye ku piraniya wan agirberdanên ku li Kirmaşanê de qewimîne, li devera "Bozîn û Merexîl, Bêstûn, Qelace, Birincan û Qerawêz"ê de bûne.

Ji aliye din ve û pêka amarên navendên pêwendîdar ên rêjîma Îranê li parêzgeha Luristanê, îsal zêdetir ji 3 hezar û 100 Hiktar ji daristan, çêrîngeh û jîngeha vê parêzgehê hatine şewitandin. Lewma tê xuya ku jîngeha Zagrosê bi awayekî sîstematîk ber bi jinavçonê ve tê birin.

Herwisa li destpêka vê gotarê de min îşare pêkir, tevî ew deverên ku me navê wan anîn, îsal dehan agirberdan li deverên "Bane, Pawe û Pîranşar"ê de qewimîne, lê heta niha amareke hûr li vê derheqê de nehatiye belavkirin.

Eva ku hewceye bala me li ser be jîngehparêzên Kurdistanê û xelkê xwebexş ên Kurdiatanê ne ku li kontrolkirin û temirandina agirên li jîngeh û daristanên Kurdistanê de zêdetirîn rol hebûne. Wan li asta herî binlind a canfîdayiyê de û bi kêmtirîn xirzmetguzariyan, bê ti çawrêyiyekê, bi hawara jîngeha nîştiman ve çon. Tevî wan hemû zehmetiyan, heta ji aliyê navendên serkutker ên rêjîmê ve jî, kevtine jêr givaşan û her îsal çendîn jîngehparêz ji aliyê navendên rêjîmê ve hatine binçavkirin. Wek mînak li heyama rojên derbasbûyî de "Xelîl Perendek ê xelkê bajarê Rewanserê û endamê encumena Parêzeranê Jîngeha Çiro, Yasir Nûrî yek ji çalakvanên jîngehparêz ên bajarê Ciwanroyê, Ferîde Weysî û Hemid Sebze ji çalakvanên jîngehparêz ên encumena Jîway û xelkê bajarê Pawê, Ferzîn Moveffeqî, Emîr Nedîmî, Hisam mehdî ên mamostayên fermangeha perwerde û hînkarî û Armanc Qurbanî ku her 4 jiwan xelkê bajarê kamêranê ne û …hd". Piştî bi dawîhatina rêûresma bi axspartina "Îsmaîl Kerîmî", çalakvanê jîngehparêz ê xelkê bajarê Kamêranê, ji aliyê hêzên îtilaata spaha pasdaran a trorîst û bikaranîna tundûtîjiyê hatibûne binçavkirin.

Cihê baskirinê ye ku li 3ê Gelawêjê de "Îsmaîl Kerîmî"yê çalakvanê jîngeyî û fermanberê fermangeha çavkaniyên sirûştî ya bajarê Kamêranê li 1ê Gelawêjê de li dema temirandina agir de şewitî bû, canê xwe ji dest da. Her li vê derheqê de "Encumena Keska Çiya" ya Merîwanê ragihandibû: "Aliyên pêwendîdar û dezgeha dad, hewce ye ew kesên ku bûne sedema agirpêketin û şehîdkirina wî ezîzî, li kintirîn demê de bo jîngehparêzan û hizra giştî bidine nasandin û siza bikin û bi lezgînî rêkarên yasayî bo rawestan li hember talançî û çeteyên jîngehê peyda bikin". Lê heta niha ti karek ji aliyê rêjîmê ve nehatiye kirin, bi vê sedemê ku tawanbarê bingehîn her bi xwe ne.

Lê sedema agirpêketin li daristan û jîngeha Kurdistanê çine?

Şewitîna jîngeh û daristanên Kurdistanê çendîn sedemên bingehîn hene, lê sedema here serekî, rêjîma Îranê ye. Rêjîma Îranê ji mêjve ye ku siyaseta talankirin û jinavbirina jîngeha Kurdistanê li ber xwe girtiye. Binkeyên leşkerî yên rêjîmê yên li ser sînorên destçêkiriyên Kurdistanê, agir berdidne daristan û jîngeha derdora binkeyên xwe.

Wek mînak her li îsal de bi pêka nûçeyek ku encumena "Pajîn" a bajarê Banê belav kiriye, "henhga merzî" ya rêjîma dagîrker a Îranê li sînorên destçêkirî yê "Hengejal û Birwêşkanî"yê, bo çendemîn car, hejmareke zêde ji darên berûyan birî ne û xisareke zêde bi jîngeha deverê gihandine. Herwisa yekek din ji armancên rêjîmê li agirberdan bi jîngeha Kurdistanê, mijûlkirina jîngehparêzan û civaka medeniya Kurdistanê bi wan agirpêketinan e da ku derfeta ti cure çalakiyeke din nebin.

Ji aliyek din ve, kes û derfetçiyên ser bi vê rêjîmê li kawilkirina daristanên Kurdistanê de rol hene. Wek mînak, hinek kes bo berfirehtirkirina baxçeyên xwe, daristanên derdora baxçê xwe ji nav dibin. Hinek kesên din jî mijûlê berhemanîna rijî û hinek din jî bi jinavbirina daristanan, dest bi ser wî erdê niştîman de digrin. Ew kesane bi şêwazên curbicur, pêwendî digel desthilatê hene, lewma bê tirs mijûlê kawilkariyan in.

**dawî**

Kawilkirina jîngeh û daristanên Kurdistanê tevî karlêkerî bi ser jîngeh û ekosîstema Kurdistanê û guherandina keşûhewayê deverê, bandor li ser rewşa hundirî ya xelkê jî daniye. Ji aliyeke din ve, bandor li ser ekotorîsm û aboriya xelkê jî daniye ku ew bi giştî, daxwaz û armanca rêjîma Îranê ye.

## Nerîna




**“Mistefa Hicrî”:**

**“Ciwan hêza tevgera guherînên kûr ên siyasî û civakî li avakirina paşerojeke cuda ne”**




**“Kemal Kerîmî”:**

**“Têkoşîna girseyî, li gorî min, ji bo bidestxistina armancan dikare bibe qonaxa herî xurt û dawî ya her têkoşînê; Dema ku neteweyek bi tevayî beşdarî têkoşînê dibe, bi hêztir xuya dike û helwesta partiyê xurtir dibe.”**



**“Mike Turner” :**

**“ Dibe ku hikûmeta Îranê heta dawiya îsal xwe wek welatekî xwedî çekên atomî bide naskirin”**



**“Maria Cornea Machado”:**

**“Kes nikare pêşî li bilindbûna hêza gel bigire”**

# Gelawêj, rêbaza 79 salan xebata bêhempa û bêmînak e



**N. Eskender Ceiferî**

Gelawêj, wateya evîna nîştiman e ji bo Kurdan. Heyva Gelawêjê di nav hemû heyvên salê de ji bo Kurdan wateyeke taybet bi xwe re tîne. Gelawêj, tê wateya hewldan ji bo rizgarbûn ji tepisandinê.

25’ê Gelawêjê 79’emîn salvegera avakirina Partiya Dêmokrat a Kurdistana Îranê ye. PDKÎ sala 1945’an li ser bingeha rêxistina Komeleya Jiyaneweya Kurd, (J.K) ku sê salan berî wê pêk hatibû, hate avakirin.

Niha jî Rasan bi hemû werz û dansalên xwe, rengê Gelawêjê dide welatê me.


Beriya çend salan dema ku Partiya Dêmokrat a Kurdistana Îranê basa xebatê dikir, digot em niha di warê rêkxistinî û siyasî de xebatên xwe dimeşînin. Lê vê carê rewş cuda ye û ev çend sal in ew partî baseke cuda dike.

Ev çend sal in ku partiyên Rojhilatê Kurdistanê dibêjin dibe ku rewş were guhertin û ji ber vê, hêzên wan hem li navxwe û hem jî li dervey Rojhilatê Kurdistanê tim amade ne.

PDKÎ ku mîratgira Komara Kurdistanê ye, çendîn caran ragihandiye ku eger şer jî çê bibe, ew amade ne. Heya niha bi hezaran şehîd jî di pevçûnên xwe bi Sipaya têrorîstî ya Pasdaran a rêjîma faşîstên Tehranê re pêşkêşî nîştiman kirine û di hember de gelek ziyan jî li Sipayê dane.

Navê projeya van çend salan a PDKÎ ku bêhna Gelawêjê lê tê, Rasan yan jî Rabûn e.

Gelawêj tenê ji bo Kurdan nayê wateya xebatê. Gelê Urogoyê yek ji wan gelan e ku di vê heyvê de serxwebûn ji xwe re bi dest xistiye. Ew sala 1825’an ji Birêzîlê cuda bûn. Neteweyeke din ku di vê heyvê de çarenivîsa xwe diyar kir, Bêlaros e ku sala 1991’an ji Yekîtiya Sovyetê veqetiya û serxwebûna xwe ragihand.




Dilê Kurdan jî bi Gelawêjê xweş e û ew ji bo ku bigihin Gelawêjeke azad, xebata xwe didomînin.

Ne PDKÎ û ne jî partiyên din ên Rojhilatê Kurdistanê, li bendê nîn in ku aliyên derve û welatên din, Îran û Kurdistanê ji bo wan rizgar bikin.

Lê ew dizanin ku piştî şoreşa Jînayê helwêsta civaka navdewletî li hemberî Îranê hinek tund e. Li gor wan, desthilata vê carê ya Amêrîkayê weke Joe Biden û Barak Obama ji Îsraîl û Seûdiyê naxwaze li hemberî Îranê nerm bin belkî wê lidij derkeve.

**Hemû partiyên netewegir ên Rojhilat û di nav de jî Partiya Dêmokrat a Kurdistana Îranê dibêjin Kurd neteweyek e û Kurdistan jî welatek e û divê partiyên Kurdî li ser bingeha berjewendiya neteweî tevbigerin.**

Gelawêj, Pûşpera xembar a Dr. Qasimlo jî bîr nake, Xakelêwa Qazî û Xermanana Şerefkendî jî ti caran ji bîr nake û lewma jî keç û xortên Kurd ref bi ref tevlî rêza xebatê dibin û li hemberî desthilata tepisandinê wate li dijî faşîzma Komara Îslamî perwerde dibin.

PDKÎ ku mîratgira Qazî Mihemed, Dr. Şerefkendî û Dr. Qasimlo ye, sala 2017’an ji bo cara yekemîn navê Pêşmergeyên Navbajêr bi kar anî.

Ew jî, ji bilî wan hêzan e ku weke Bazên Zagrosê têne binavkirin û bi têknîkên xwe û bi riftar û kiryarên xwe dişibin vê partiyê û xelk jî, wan, ji vê partiyê cuda nabîne.

**Tevî ku PDKÎ berpirsyaretiya kiryarên wan nedaye ser xwe, lê Rasan bi hemû demsalên xwe, Pêşmergeyên Navbajêr, Pêşmergeyên Çiya, Bazên Zagrosê û… hemû di xizmeta Gelawêja 79 salan xebat û berxwedanê de ne û di pêxema pêşerojeke geş de ne.**

Ne sêdareya Çarçirayê, ne têrora Viyenê, ne têrora Mîkonosê û ne jî şehîdkirina bi hezaran keç û xortên Kurd, nekarî bejna neteweya me li hemberî dagirkar bitewîne.

Lê belê xebata wan ji berê germtir û xurttir bûye û bi tîrêjên welatê agir û rojê, sibeh û şevê, dilên ciwanan ji bo evîna welat dinexşîne.

Kevnartirîn partiya Kurdî ku bi awayekî rêkxistinî, di qonaxên cuda de ji serdema Komara Kurdistanê ve li ser piyan sekinî ye, bi xebata veşartî di serdema rêjîma faşîst a Pehlewiyan de û bi xebata eşkere ya bi destê Dr. Qasimlo, nîşan da ku modêrnîzebûn, tenê ev nîn e ku berên xwe bidin welatên rojava û her tişta ku ew bikin, Kurd jî bikin.

Bê guman PDKÎ nîşan daye ku dilê Gelawêj û Gelawêjdostan nahêle û bi dahênanên nû yên weke Rasanê, dê ji bo dabînkirina mafên neteweî û dêmokratîk û modêrn ên Kurdan, di kar û xebata xwe de berdewam be.

**Peyama pîrozbahiya Hizba Şiyû`î ya Kurdistanê bi hilkefta 25ê Gelawêjê**

**Bo rêzdar Rêberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

Li 79emîn salvegera avakirina hizba ve ya têkoşer, Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, li ser navê Mekteba Siyasî û Serkirdayetî û hevrêyên me, em pîrozbahiyeke gerim li we dikin û hêviya serkevtin û serbilindiyê bo we dixwazin.
Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li dîroka xebat û tekoşîna xwe de li tevgera rizgarîxwaziya gelê me li Rojhilatê Kurdistanê de li pêxema bidestveanîna azadî û mafên rewa yên gelê me de dîrokek bi şan hebûye û li vê pêxemê de çendan şehîd û qurbqanî jî dane.
rêzdaran
Li vê demê de ku yada salvegera avakirina Hizba ve ya têkoşer dikin, cîhan û dever li rewşeke hestiyar re derbas dibe, Bi sedema alozî û dijheviyên li Rojhilata Navîn, niştimana me jî ji vê rewşê bi dûr nemaye. Lewma vekhevî û yekhelwîstiya hêz û aliyên siyasî, hewcehiyek girîng bo vê qonaxê ye.
Li vê hilkeftê de careke din em tekezî li ser pêwendî û dostayetiya ji berê ve ya Hizba Şiyû`î a Kurdistanê û Hizba ve ya xebakar dikin
***Her şad û serbilind bin***
***Digel rêzê*** ***Mekteba Siyasiya Hizba Şiyû`î a Kurdistanê*** ***25ê Gelawêja 1403 a Rojî***

**Peyama Hizba Zehmetkêşanê Kurdistanê bi hilkefta 25ê Gelawêjê**

**Rêzdar: Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdiatana Îranê**

silavek germ
Bi hilkefta 79emîn salvegera avakirina Hizba Dêmokrat a Kurdiatana Îranê em gelek bi germî pîrozbahî li we rêzdaran û li hemû endam û alîgirên têkoşer ên Hizba ve dikin, hivî dikin ku ew hilkefta dîrokî, derfeteke din bo vekhevî û giringîdan bi xebata li pêxema bidestveanîna armancên bilind ên gelê me be.
Rêzdaran…
25ê Gelawêjê, li 79emîn salvegera avakirina Hizba Dêmokrat a Kurdiatana Îranê li rewşeke hestiyar de bi rê ve diçe, bi sedema şer û lêkevtên şer, aşitî û aramiya cîhan û deverê li jêr gefê de ye, ew rewşa aloz, karlêkerî li ser Kurdistan û tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê heye, lewma bo rawestan li hember wan astengiyan, em bûna dîtingehek siyasî û şirovekirin û têgihîştina wan mijaran li navbera aliyên siyasî yên Kurdistanî, bi hewce bo vê qonaxê dizanin.
Her li vê bîranînê de em tekez li ser pêwendiyên dostane yên li navbera Hizba Zehmetkêşanê Kurdiatanê û Hizba Dêmokrat a Kurdiatana Îranê dikin
***Digel rêzê*** ***Mekteba Siyasiya Hizba Zehmetkîşanê Kurdistanê*** ***25ê Gelawêja 1403 a Rojî***

**Serokê Giştî yê Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK) Mustafa Ozçelîk: Em 79emîn salvegera damezrandina PDK-Îranê pîroz dikin**

PDK-Îran di 16ê tebaxa 1945ê de li Mehabadê bi serokatîya Pêşewa Qazî Muhammed hat damezirandin.
PDK-Îran(Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê) îro 79emîn salvegera damezrandina xwe pîroz dike.
PDK-Îran a ku li ser xîmê Komeleya Jîyanewey Kurd pêk hat, piştî çend mehan Komara Kurdistanê ava kir û rêveberîya wê kir.PDK-Îran eve 79 sal e hêzeke esasî ye ku têkoşîna miletê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê gihandîye roja îro.
PDK-Îran partîya Pêşewa Qazî Mihemed, partîya şehîdên nemir Dr.Qasimlo û Dr.Şerefkendî ye û eve 79 sal e bi hişmendî û sîyaseta xwe ya netewî, niştimanî , welatperwerane, wek aktorekî esasî li Rojhilatê Kurdistanê , doza azadîya Kurdistanê dimeşîne, barêkî bi rûmet hildigire.PDK- Îran di têkoşîna azadîya Kurdistanê de bi hezaran şehîd û bedel daye.Lê tu carî ala azadî û têkoşînê li erdê nexistîye.Wê Alaya Rengîn a Komara Kurdistanê gava li Mehabadê li ba dida, weke bayê azadîyê tesîra xwe li her sê perçeyên din ên Kurdistanê jî dikir.
Îro jî ew alaya ku Pêşewa Qazî Mihemed teslîmî Mele Mistefa Barzanîyê nemir kir, bi xebat û têkoşîna pêşmerge, têkoşer, xebatkar û kedkarên doza azadîya Kurdistanê, li her çar perçeyên Kurdistanê jî li ba dide.Me duhî jî îro jî têkoşîna xuşk û birayên xwe yên Rojhilatê Kurdistanê her wek têkoşîna xwe dîtîye. Di vê têkoşîna pîroz de, em bi her awayî li gel xuşk û birayên xwe yên Rojhilatê Kurdistanê ne û tu şika me jê tuneye ku gelê me li hemû perçeyên Kurdistanê dê azadîya xwe bidest bixe.
Em di 79emîn salvegera damzrandina PDK-Îranê de rêberê gelê Kurdistanê Peşewa Qazî Mihemed, şehîdên nemir Dr Qasimlo û Dr Şerefkendî û hemû şehîdên Kurdistanê bi giramî bibîr tînim.Em bi bawerî û bi hestên xwe yên netewî, niştimanî û birayane, ji Bakurê Kurdistanê 79emîn salvegera damzrandina PDK-Îranê pîroz dikin.
***16.08.2024 Mustafa Ozçelîk Serokê Giştî yê Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK)***

**Peyama pîrozbahiya Hizba Xelkê Belûçistanê bi hilkefta 25ê Gelawêjê li 79emîn salvegera avakirina Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

Hizba Xelkê Belûçistanê bi hilkefta 79emîn salvegera avakirina Hizba Dêmokrat peyamek belav kir û ragihandiye ku she bi şanaziyê dike ku bi mifahvergirtin ji ceribandinên bi nirx ên 8 dehikan ên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê niha bi hev re li xebateke hevpar de ne.
Li beşeke vê peyamê de hatiye ku Hizba Dêmokrat a Kurdistan Îranê li 25ê Gelawêja sala 1324 a Rojî bi rêberiya şehîdê doza azadiyê “Qazî Mihemed” û hevrêyên wî bi şêwazeke demokratîk û modern hate avakirin.
Herwisa li beşeke din a peyamê de hatiye ku Hizba Dêmokrat li qonaxa jiyana dîrokiya xwe de serkevtin û şikestên zêde ceribandine û kariye pêgeheke xuya li nav gelê Kurd û deverê wek berevanîkirin ji serweriya netewiya Kurd û berevanî li mafê çîn û qatên xelkê Kurd bo xwe diyarî bike.
Li beşeke din a peyamê de jî hatiye ku Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li avakirina Kongireya Netewên Îrana Federal de rola herî serekî û avakerî li lihevanîna netewên bindest ên Îranê de heye. Kongireya netewên Îrana Federal li qonaxa piştî komara îslamî, dikare roleke yekalîker li diyarîkirina sîstema paşerojê û bi destveanîna mafên vekhev bo hemû xelkê Îranê hebe.
Herwisa li vê peyamê de hatiye ku li şoreşa “Jin Jiyan Azadî”yê û rola Kurdistana qehreman û Hizba Dêmokrat, binyatên rêjîma faşîstiya komara Îslamî hejand û soza pêşerojekî azad da hemû xelkê Îranê ku bi şêwazekê bikarin seh bi bihevrejiyana aşitîxwazane bikin.
Hizba Xelkê Belûçistanê ji dil ve pîrozbahiya salvegera avakirin a Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li netewa Kurd û endam û alîgirên Hizba Dêmokrat dike û she bi şanaziyê dike ku bi mifahvergirtin ji ceribandinên bi nirx ên 8 dehikan ên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê niha bi hev re li xebateke hevpar de ne.

**Peyama pîrozbahiya Partiya Dêmokrata Kurd li Sûriyê, bi hilkefta 25ê Gelawêjê**

**Birayê têkoşer Mistefa Hicrî, û Xweîşk û birayên têkoşer ên Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê!**

Bi hilkefta 79emîn salvegera avakirina Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, Em pîrozbahiyê li we rêzdaran û hemû endam û alîgirên Hizba ve dikin. Bi vê hilkeftê daxwaziya serkevtinên zêdetir bo we û hemû endamên Hizba we li meydana tekoşîn li pêxema xizmetkirin bi doza rewya gelê Kurd dixwazin.
Hizba Dêmokrata Kurdî li Sûriyê(Elpartî) û sekreterê vê "Ebdulrehman Hebeş" tekeziyê li ser girîngiya biratî û bihêzbûn û berbipêşveçona pêwendiyan li navbera Hizbên me de dikin û herwisa li pêxema xizmetkirin bi doza rewa ya gelê me û tekoşîn li pêxema mafên rewa yên gelê Kurd li hemû beşên din ên Kurdistanê, tekezî li girîngiya xebata hevpar li navbera Hizbên xwe dikin. Hemû dijayetî û alozî bo me rohn in ku li encama siyaseta dîktatorî û şêvênîzm û regezperestiya ku li hember gelê Kurd sekinîne û înkara bûna gelê Kurd dikin.
**Li dawiyê de careke din, bi dil û can hêvîya serkevtina zêdetir û gihîştin bi armanc û bidestveanîna daxwaziyên gelê Kurd bo we dixwazin.**

---

**Peyama pîrozbahiya Partiya Demoqrata Pêşverû ya Kurdî li Sûriya bi hilkevta 25ê Gelawêjê bo Hizba Dêmokrat**

**(PÎROZBAHÎ)**
Birayê hêja: Mistefa Hicrî (Berpirsê Giştî yê Navenda birêveberî).
Berêzan: Endamên Navenda Rêberiya (Partiya Demoqrata Kurdistanî Îran).
Silav û rêz ji bo we tevan:
Bi helkefta (79)'mîn, salvegera dameziriandina partiya we ya xebatker (Partiya Demoqrata Kurdistanî Îran), em bi navê Deftera Siyasî ya partiya xwe (Partiya Demoqrata Pêşvero ya Kurdî li Sûriya), û bi navê hemî heval û dost û alîgirên xwê em we û heval û dostên partiya we ya bira tevan pîroz dikin, û hêviya serkeftinê ji xebata we ya rewa re dixwazin ji bo bi destxistina mafê miletê kurd li Rojhilata kurdistan.
Em îro vê bîranînê li we pîroz dikin di demekê de ku xweşbextane we bi serkeftî yekrêziya partiya xwe parast, û rêzên xwe kirin yek, ji ber ku yekrêziya we baştrîn çeke li dijî vê rêjîma kevneperest û hov, û ji bo bidestxistina mafê miletê kurd li rojhilata kurdistan.
Her wiha, di dema ku em şanaziyê dikin bi wan pêwendiyên dîrokî di navbera herdû partiyên me yên birade, em dûpat û tekeze jî dikin li ser xurtkirin û kûrkirina van pêwendiyan di xizmeta miletê me û pirsa wî ya netewî de.

**Her bijîn..** **Qamişlo : 16.8.2024** **Mekteba Siyasî ya Partiya Demoqrata Pêşverû ya Kurdî li Sûriya**

---

**Peyama pîrozbahiya Partiya Rencderan a Kurdistanê bi hilkefta 25ê Gelawêjê**

Bi hilkefta 79emîn salvegera avakirin û ragihandina Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê û derbasbûna 79 sal xebat û tekoşîna bê rawestan a xelkê Rojhilatê Kurdistanê, em germtirîn pîrozbahiyên xwe bo we rêzdaran û hemû endamên rêberatî, kadir û pêşmergên we yên qehreman û endam û alîgir û tevahiya xelkê têkoşer û berxweder ên Rojhilat dişînin.
Di pareke dinê ye peyama Partiya Rencderan a Kurdistanê de hatiye:

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li rewşeke dîrokî, hebûna xwe ragihand, wek hewcehiyekê li vê qonaxê de pêngaweke mezin û xwedî bandor li tevgera siyasiya Kurdistanê, guherînek li jiyana siyasî û civakî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê de bû û wek destpêkê karî hemû çîn û qatên civaka Kurdistanê li devra xwe kom û rêkxistin bike.
Fîdakarî û qurbanîdana ji ast derketî li pêxema bidestveanîna mafên rewa yên gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê de dane, li dema hewce de piştevanî li xebata beşên din ên Kurdistanê kiriye. Her ji destpêka avabûna Herêma Kurdistanê li Başûrê Kurdistanê, rola xwe wek parêzvanî li destkevtên gelê me li Başûr de wek erk û berpirsayetiya dîrokiya xwe bi cih aniye û hertim cihê pêzanîn a hêzên siyasî û dilxweşiya xelkê başûr bûn.

**Bi vê hilkeftê em tekezî li ser berdewambûn û qahîmkirina pêwendiyên me li ser binyata xepata hevpar û hevkarî bo xizmetkirin bi gelê me yê sitemdîtî dikin.**

---

**Peyama pîrozbahiya Yekîtiya Zanayên Ayînî ya Kurdistana Îranê bi hiîlkefta 25ê Gelawêjê**

**Di parek li peyama Yekîtiya Zanayên Ayînî ya Kurdistana Îranê de hatiye:**

Yekîtiya Zanayên Ayînî ya Kurdistana Îranê bi hilkefta 79emîn salvegera avakirina Hizba Dêmokrat, pîrozbahiyê li we dike û tevî piştevanîêkirin li vê Hizba netewî, daxwaziya gihîştin bi armancan, bo vê hizbê dike.
Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, Hizbeke modern û xwediyê proseyeke mezin a hizra netewî ye û avakirina vê Hizbê wek yekem hizba modern li çar beşên Kurdistanê, hewcehiyeke dîrokî û pêwîst bû.

Bi avakirina Hizba Dêmokrat li Rojhilatê Kurdistanê, daxwaz û armancên gelê Kurd pê avête qonaxeke din û ji serhildaneke kilasîk ve ber bi modernbûnê û vekhev digel daxwaziyên cîhanî û erêkirî yên rêkxiravên navnetewî, pênaweke erênî û dîrokî hilda.
Niha piştî derbasbûna zêdetir ji 78 sal ji xebat û berxwedan bo gihîştin bi armancên gel, ew doza herwisa micidtir ji berê, xortên gelê me emegdartir in bi vê rêbazê ne û xelkê Kurd, rêdetir ji caran jî şanazî bi hebûna Hizba Pêşewa dike.

**Hizbek ku li heyama 79 salan her wa bi roj û cihê baweriya gelê xwe be, bê guman serdikeve û digiîje armancên xwe, yekek ji wan şanaziyên ku Hizba Dêmokrat a Kurdiustana Îranê bi dest xwe ve aniye û cihê baweiya xelkê Rojhilatê Kurdistanê ye Hizba hemû çîn û qatên vê civakê ye.**

# Pirsgirêka newekheviyê



**N. Vênûs Fayq**
**W. Hesen Mukerem**



Sala borî, daweta keça nivîskar û lêkolînera Tûnisî Ulfa Yûsif li ser medyaya civakî bû sedema nîqaşan dema ku du jinan, “her du dayikên bûk û zava”, bi amadebûna dadwerek jin peyman îmze kirin.

Ev nûçe ji bo gelek kesan şok bû, ji bo gelek kesan jî şahî bû û nîşana wekheviya ku jin ev zêdetirî sed sal in ji bo vê bangesşe dikin.

Ez dizanim ku ev helwest hinekî fermî ye û naverok û ruhê qanûnên statûya kesane naguherîne li welatên ku li ser bingeha şerîetê ne û li gorî Quranê hemî maf û erkên jinan ji bo jinan ji aliyek din dixe ku şiroveya daxwazên bingehîn yên hezaran jinan û şroveya vê dibe ev wekheviya ku ev zêdey sedan sale ku jin bo xebatê dike .

Jixwe, ger ez wekî jin nekarim tenê peymanek zewacê îmze bikim ku jin beşek zindî ya wê zewacê ye, pênaseya wê wekheviyê çi ye?

An jî pênaseya wekheviyê çi ye dema ku ti peymanek zewacê ne derbasdar e ku ji hêla du mêran ve neyê îmze kirin û heke ji hêla jinek ve hatî îmze kirin betal be?

Ez jî dizanim ku ya rewatî daye zagona ku jinan di bin mêran de bi cih dike, xemsarî û bêdengiya jinê ya li hemberî vê heqaretê ye.

Li gorî we dê nifşên pêşerojê ji me re çi bibêjin?

Em bi qasî dema xwe ji bo kirîna modelên herî dawî yên cil, pere, Botox, ciwankarî, kozmetîk û emeliyatên guhertina ser û çav û ruxsarê xwe dikin, Ger em nîvê wextê xwe bidin mijara wekheviyê û li ser mijarên kosmetîk ên ku mêran keşf kirine ji bo ku jinan bixe xew û bêdeng bikin bifikirin, wê jin bala xwe bidinê û ji mijara mirovatiya wan dûr xistine.

**Ger zarokên kur û keç xwedî derfetên wekhev ên perwerdehiyê û gihandina wekhev a bazara kar bûna, Wê demê jin dê bikarin bi xurtî li ser mafê wekheviyê israr bikin, diviyabû niha pirsgirêka jinan gelek pêşketiba, lê bi rastî nîvê wê rast e, ji ber ku piraniya doktorên jin di nexweşiyên jinan de pispor in..**


**Divê em li hember wan kesên ku hêviyên herî kêm ji vê civakê hene rawestin, ji ber ku eger em wê neguherin, civak ji bo tiştekî nayê guhertin.**

Parêzerên jin bi piranî li ser dozên jinan dixebitin Piranîya nivîskarên jin ku yek ji wan ez bixwe me li ser mijarên jinan dinivîsin û li ser pirsgirêkên jinan dixebitin.

Lê aliyên din kîjanin ku dibe em mil bi milê mêran bixebtin mîna wekheviyê?

Lê her gavekî wêrek di vî warî de divê were nirxandin û wekî gavek ber bi hişmendiya mezintir û guhertinek mezintir di berjewendiya jinan de were xwendin.

Wekhevî nayê wateya tiştên ku em tê de ji cinsê din cuda ne, lê nêrîna cuda li tiştên ku li ser me hatine sepandin û em cuda û newekhev kirine.



# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Rêjîma Îranê li sibêdeha 23ê Gelawêjê, 6 kes bidar vekirin

Rêjîma dijemirov a Îslamiya Îranê li girtîgehên xwe yên li bajarên Qezwên, Kirman, Refsencan û Bender Ebbas"ê de 6 kes li sibêdeha roja Sêşemî 23ê Gelawêjê de bidar vekirin.

Sibêdeha roja Sîşemî 23ê Gelawêjê, "Mîlad Kemalîpûr", "Ferecullah Xaşî(Cemal Zihî)", li girtîgeha rêjîmê li bajarê Kirmanê de hatine bidarvekirin û li girtîgeha rêjîmê li bajarê "Bender Ebbas"ê de jî kesekî xelkê Efxanistanê yê bi navê "Ebdullah Laştxûnî" û kesekî din ê bi navê "Hamid Mozefferî" hatine bidarvekirin.

Herwisa li bajarê Refsencanê de jî, kesekî xelkê Efxanistanê ku nasnameya wî nehatiye zanîn li sibêdeha roja Sêşemî 23ê Gelawêjê dehatiye bidarvekirin.

Li girtêgeha navendî ya rêjîmê li bajarê Qezwênê de jî binçavkiriyek ku li ragihandinan de navê wî bi "Mihemed Qurbanî" hatiye belavkirin, bi awayekî nihênî û bê agehdrakirina malbata wî, li sibêdeha vê rojê de hatiye bidarvekirin.




## Rêjîma Îranê hejmarek ji çalakvanên medenî û jîngehparêz li Giyelanê binçav kirin

Hêzên îtilaata spaha pasdaran a terorîst, 8 çalakvanên jîngehparêz û çalakvanên medenî yên xelkê bajarê Giyelanê, binçav kirin û bo ciheke nexuya, veguhastin.

Pêka rapora "Hengaw"ê, 8 çalakvanên medenî û jîngehparêz ên xelkê bajarê Giyelanê ser bi parêzgeha Kirmaşanê yên bi navên "Mariya Xanî, Cehangîr Azadî, Lutfullah Perwîz, Hemîdriza Rehîmiyan, Selman Perhan, Mihemed Perwîn, Elî Ferecxanî û Mistefa Rostemî", ji aliyê hêzên îtilaata spaha pasdaran a terorîst ve hatine binçavkirin û bo ciheke nexuya, hatine veguhastin.
Pêka vê raporê li sibêdeha roja Sêşemî 23ê Gelawêjê, hêzên îtilaat a spaha pasdaran a terorîst bê hebûna ti belgeyeke yasayî, êrîş kirine ser mala wan çalakvanan û bi awayekî tundûtîj, ew binçav kirine.

Ew çalakvanên xelkê Giyelanê li kempêynek a bi navê "Nicat Zagros" anku "Rizgarkirina Zagrosê" de wajo kom kiribûn û bi awayekî çalakane li temirandina agirpêketinên vê dawiyê de beşdar bûne û cehda temirandina giran kirine.
Tevî hemû cehdên malbatên wan çalakvan, ti zanyariyek li derheq sedema binçavkirin, tohmetên sepandî û cihê ragirtina wan çalakvanên medenî û jîngehparêz li berdest nîne.




## Rêjîma Îranê 2 welatiyêpn Kurd binçav kirin

Ciwanekî xelkê bajarê Pîranşarê, ji aliyê spaha pasdaran a terorîst ve, hate binçavkirin û herwisa li bajarê Mihabadê de jî welatiyek a wî bajarî ji aliyê hêzn ewlehî ve hate binçavkirin.

Pêka rapora "Çaw News"ê, cîwanekî temen 25 salî yê bi navê "Rehman Qadirî" xelkê gundê "Endêzê" ser bi bajarê Pîranşarê, piştî gazîkirina bo îdareya îtilaat a spaha pasdaran a terorîst li wî bajarî, hate binçavkirin û rastî lêpirsînê hat.

Herwisa li bajarê Mihabadê de jî, welatiyek a bi navê "Gelawêj Mihemediyê Erşed" ya temen 45 salî li dema zivîrîn ji kargeha xwe ya dirûmanê li şeqama "Baxê Şayêgan"ê de bi awayekî hovane û bi tundûtijiyê ve ji aliyê hêzên ewlehî yên rêjîmê li wî bajarî de hate binçavkirin û bo ciheheke nexuya hate vegihastin.

Heta belavbûna vê nûçeyê, li derheq sedema binçavkirin û tohmetên sepandî bi ser wan welatiyên Kurd, ti zanyariyek li ber dest nîne.



# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (476)

